# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (154):


## Gundên "Qaşa û Cela" yên dagîrkirî, roxandina goristanekê û derxistina termên şehîdan jê û berevajîkirina rastiyan, topebarana Bajarê Efrînê û qurbanî














Ji sê rojan ve destlatên Dagîrkeriya Turkiyê bi riya ragîhandina xwe û bi hevkariya hin ragîhandina rikberiya Sûriyê û hin din ên Ixwanî û Kenala "Elcezîrê" ya Qeterî, bi her awî hewil dikin ku şanoya dîtina "goristaneke komane ye kesine ku hêzên Kurdî berî ku li 18.3.2018an ji Efrînê derkevin ew îdam kirine, weke ew dibêjin", û bi ragîhandineke fermî ji aliyê Şalyariya Bergiriyê ya Turkiyê û waliyê "Hetayê" ve, çêkin û belav bikin, da ku rewatiyê bidin talana xwe ji herêmê re, sûcê tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê yên ku di dermafê mirov, dar û keviran de dikin ji ser xwe û milîseyên Islamewî yên pêve girêdayî rakin, û bi hewildaneke nû tewanbariya terorê bi Kurdan û hêzên wan ve bizelqînin û navûdengê wan li pêş cîhanê reş bikin.

**Vaye emê beşekî ji wan tewanan rewan bikin:**

**= G."Qaşa":**

Gundekî çiyayî û biçûk e, girêdayî Navça Bilbilê ye û /12/ KM ji navenda wê dûr e, ji /50/ malî pêk tê, dora /300/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen lê rûdiniştin, tenê jê /35 malbat=100 nişte/ ji ber koçberkirina zorane lê man, û dora /15 malbat=100 nişte/ ji anîndeyan -piraniya wan ji Turkmanê Gundewarê Humsê ne- tê de hatin niştecîkirin.

Di dema êrişkeriyê de, dibistana gund a seretayî û deh mal ên van hemwelatiyan "Mihemed Hac Reşîd, Şe'iban Mistefa, Mihemed Horîk Xelîl, Mistefa Şe'iban Mistefa, Horîk Me'imo Reşîd, Hemîd Mihemed, Mihemed Şêxmûs Goçer, Mistefa Menan Reşo, Ebdo Elî Ebdo, Mihemed Silêman" bi giştî hatin roxandin, û herweha jî roxandina heyşt malan ên van hemwelatiyan "Ehmed Hemîd Mihemed, Ebdo Hac Reşîd, Bekir Goçer, Menan Mosak, Mehmûd Mistefa, Kemal Hac Reşîd, Fehîm Me'imo Xilo, Şêxmûs Umer Goçer" bi piçekî.

Milîseyên "Firqit Elsultan Mûrad" (ya ku "Ebû S'îd - ji xelkê Gundê "Kêsîn" - Gundewarê Humsê" serkêşiya wê di gund de dike) gund desteser dike, û ew e ya ku piraniya heyînên malan ji firaxên baqirî û qizêzî, amûrên elektirîkê, cerên gazê û tiştên din, herweha kebil (kêbil) û guheztoka (trans) toreya elektirîkê ya giştî, piraniya acetên guvêşgeha zeytûna ya "Mihemed Cûkêr - Bavê Bêkir", du tirektorên çandiniyê yên "Çîlo Şêxo, Gîvara Reşo", acetên çandiniyê (Kîlfetor, tirêle, /5/sîtêr guhestina avê), otombîlek salon Foks - servîs e "Yasîn Şêxo" , otombîlek cîp e "Fehîm Me'imo", otombîlek teksî Sabe ye "Reşo Hac Reşîd" û hejmarek matorên duloqî diziye, her weha dest daniye ser dora /15/ hezar darên zeytûnê ji reseniya /25/ hezar dar ên xelkê gund, û dora /15%/ wek bace li ser werzên zeytûna ferz dike; û piraniya werzên tirî, simaq û behîva ji aliyê çekdar û anîndeyan ve têne dizîn.

Weha jî Cîgeha "Girê Sûsê" kola û tevda, ji bo lêgerîn û dizîna kevneşop û kinzan.

Di dema êrişkirina gund de, sê şervan ji Yekîneyên Parastina Gel (YPG) di berevaniya di ber gund de pakrewan bûn, û dema xelk vedigeriyan gund, hemwelatî "Ednan Hac Reşîd Keko/55/sal" û "Fatme /70/ sal - Hevjîna Horîk Xelîl", di encama teqîna bombeyeke zemînî ye di mala wê de şehîd ketin; Herweha jî xelkê gund rastî rengereng binpêkirinan hatin, jê: Girtina /11/hemwelatiyan û tûşîhatina wan ji işkencekirinên govdeyî û derûnî yên mekin û danûstandinên hişk re, bi ser de jî neçarkirina wan di hepsê de ji rojî û nimêjê re, û fitarvekirin jî her /24/ katan sendewîçek bû.

**= G."Cela":**

Bi Navça Reco ve girêdayî ye û /12/ KM ji navenda wê dûr e, ji dora /80/malî pêk tê, dora /350/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, bi sedema keçberkirina zorane tenê dora /15 malbat= 45 nişte/ tê de man, û dora /70 malbat = 400 nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Di dema êrişkeriyê de /3/ mal ên "Dilovanber Hesen Ehmed - Zêbê, Dilovanber Hisên Ehmed - Zêbê, Doxan Hec Hisên" bi tevahî û /3/ mal jî bi piçekî hatin roxandin, û piştî dagîrkirinê Milîseyên "Feyleq Elşam" û serkêşê wê yê li gund "Ugil Umer - Bajaroka Biyanûnê - Bakurê Heleb" hemî heyînên malan ji xwarinvexwarin, firaxên baqirî, alav û amûrên elektirîkê, cerên gazê û tiştên din, tirektora çandiniyê ya "Ebû Elî Hawo Xalêd", tobabeke mezin ji perçeyên guhertinê yên otombîlan ji embara "Mihemed Ebid Elrehman Ehmed" û hemî kebil (kêbil) û piraniya stûnên toreya elektirîkê ya giştî, dizîn.

Milîseyan mala "Zêneb Bîlal - berê ya Şukrî Mistefa" ji xwe re kirin biryargeheke leşkerî û hepis, û mala "Mihemed Ebid Elrehman Ehmed" jî ji "Feyleq" re kirin mêvanxane.

Û "Feyleqê" dest danî ser dora /5/ hezar dar ên zeytûnê û /3/ hezar mêwên tirî, û ji /10-15%/ vêrgî li ser werzên zeytûna û yên din ferz kir, herweha "Ugil Umer" jî tîmargeheke çêlan di avahiya guvêşgeha hemwelatî "Seydo Esker" de çêkir, bi hemwelatî "Ehmed Mistefa" re di tîmargeha wî ya "mirîşkan" de

hevpariyê dike, keriyek pez (dora 200 serî) jî hewandiye û bêguneh di nav zeviyên hemwelatiyan de diçêrîne, û dest daniye ser dora /6/hezar mêwên tirî ji malmewalên xelkê G."Elemdara" yên li aliyê G."Cela".

Û milîse ji bo êzingkirinê û çêkirina komirê di qutkirina darên ihracê yên bi ser gund ve û qutkirina darên zeytûnê bi şêwakî hovane de, berdewam dikin, û dorpêçeke ewlehî li ser niştecîyên gund ên resen ên mane ferz dikin, di ketin û derketina gund de hemî derên wan dipelînin û tevgera wan asteng dikin, herweha pir ji wan jî işkence kirin û vêrgî û baceyên diravî li wan ferz kirin.

Weha jî li 2.12.2019an, hemwelatî "Hisên Ebdela Gul Dehdo/74/sal" ji xelkê gund, di komkujiya ku Artêşa Turkiyê û nandozên wê li Bajaroka "Tilrif'etê" a tijî koçberên Efrînê - Bakurê Heleb bi topebaranê kirî de, şehîd ket.

**= Tarûmarkirina goristanekê, derxistina termên şehîdan û berevajîkirina rastiyan:**

Ji destpêka dijberiya bi ser Herêma Efrînê hatiye ve, Artêşa Turkiyê û milîseyên nandoz bi dehan ji zaretgehên olî yên Islamî û Êzdî, gorên niştîmanperweran, goristanên şehîdan û hin din ên sivîlan bi awakî mebestkirî armanc kirin, û hin jê li ba xelkê weke şanegeh û zaretgehan bûn, mîna(Goristana Şehîd Refîq - Gundê "Metîna"/Navça Şera, Goristana Şehîd Seydo - Bajaroka Kefirsefrê/N.Cindirêsê, Goristana Şehîd Avêsta Xabûr - Riya Keferşîlê/ Efrîn) - bi tevahî hatin roxandin û tarûmarkirin, da ku dîroka herêmê were tevlihevkirin, bîriya civakê bê pişaftin û girêdana xelkê ji ax û fedekariya zaroyên wan were birîn; Û di navboriya van hersê rojan 14-15-16/7/2021an de, destlatên dagîrker bi beşdariyeke pir ji saziyên ewlehiyê û Istîxbaratên Turkiyê û di bin parastineke guvaştî de, goristaneke li saz û ji xelkê Efrînê ve naskirî, li cîgeheke Bakurê Kolana "Lîskê û demborandinê - Elmelahî", li piş avahiya Zanîngeha Efrînê ya berê û li orta Efrînê, bi alavên giran kolan û tevdan, û /71/termên sivîl û şervanên Kurd (ên ku di dema dorpêçkirin û topebarana bajêr de, li navîna Avdara 2018an pakrewan bûne) jê derxistin û guhestin Nexweşxana Leşkerî, û bi derewîn û buhtanî gotin ew "goristaneke komane ye hin kesan e, û hêzên Rêveberiya Xweser a berê ew kuştine"!

Lê piştî şopandin, lêgerîn û têkildariyê bi xelkê Efrînê re û wergirtina gelek wêne û du perçevîdyoyan, me tekez kir ku goristan li navîna Avdara 2018an ji aliyê Rêvebiriya Xweser ve hatiye çêkirin û ne bi dizî ye. Piştî pirbûna bombebaranê û dorpêçkirina Bajarê Efrînê, û veşartina terman di goristana "Avêste Xabor - R.Keferşîlê" - Ro'avayê bajêr de çetin bû, li 13.3.2018an bi oxirkirineke fermî termên /32/şehîdan - navên piraniya wan tomarkirî ne- têde hatin veşartin, û weha jî li 16.3.2018an pakrewanên komkujiya Taxa Mehmûdiyê û yên Nexweşxana Efrînê têde hatin binaxkirin. Û ta navîna sala 2019an kêlikên goran diyar bûn, û hin merivên şehîdan seredan jî jê re dikirin, lê ji aliyê çekdaran û rêwiyên anîndeyan ve hatin hilkirin û rakirin.

**= Binpêkirinên din:**

- Ji heftakê ve, Milîseyên "Firqit Elhemzat" û serkêşê wê "Nûrî Elelî - Ebû Sultan" li gundên "Kokanê Jorin û Jêrin" - Navça Mabeta, bi behaneya parastina malmewalên xelkê, li ser her malbatekê vêrgiyek/200-1000/ PT ferz kirin. Li herdu gundan dora/60/malbatî heye, yanê tevaya vêrgiyê dighêje dora/30/hezar pereyên Turk.

- Li 11.7.2021an, Asayiş Mabeta ev hemwelatî "Cemal Ebdo kurê Mistefê/34/sal, Ehmed Hesen kurê Mihemed/25/sal" ji xelkê G."Kokanê Jorin" - N.Mabeta vexwendin, û bi behaneya tewanbariya Milîseyên "Firqit Elhemzat" ji herdiwan re bi wergirtina çekan ew girtin, bi ser ku wan berî demekê vêrgiyên diravî (Cemêl dora hezar dolarî, Ehmed dora sê hezar dolar) dabûn serkêşê wê yê li gund.

- Li 29.6.2021an, Milîseyên "Asayişa leşkerî" hemwelatî "Şivan Mecîd Ne'isan/35/sal" ji xelkê Gundê "Tilifê" û li Bajarê Efrînê rûdine girtin, û li 16.7.2021an jî berdan.

- Li Pêncşemê Êvarî 15.7.2021an, B.Efrînê rastî hejmarek avêjtekên mûşekî hat, tev di nav taxên niştecîbûnê de ketin, û di encamê de, ziyanên şênberî çêbûn, elektirîk ji ser bajêr qut bû, û /12/sivîl ji niştecîyên resen û anîndeyan bûn qurbanî û birîndar, jê: Pakrewan "Ridwan Cemîl Silêman/40/sal" ji xelkê Gundê"Sêwiya" - N.Mabeta.

- Li Şeva Yekşemê 11.7.2021an, hêzên Artêşa Turkiyê Bajaroka Tilrif'etê - Bakurê Heleb ya tijî Koçberên Efrînê topebaran kirin, di encamê de pênc sivîl cûrbecûr birîndar bûn, ew jî ev in: "Mihemed Welîd Ereb/5/sal, Hêvîn Reşîd/40/sal, Sozan Me'imo/30/sal, Zêneb Ehmed Ereb/40/sal" ji xelkê N.Reco û "Nîhad Mihemed Elî/32/sal" ji xelkê N.Cindirêsê.

- "Berevaniya Sivîl li Efrînê - Eldîfa'i Elmedenî" tekez kir ku tîmên wê agirek li daristaneke N.Cindirêsê vemirand, û wê wêneyên diyarkirinê jî belav kirin, û têde kokên darên ihracê yên berê ji bo êzingkirinê hatine qutkirin dihatin xuyan.

Virûvûtên riswabûyî yên ku Turkiyê û Kiwalisyona Sûrî - Ixwanî û milîse û hin aliyên Sûrî yên rikber di dermafê Kurdan û Hêzên Sûriyê yên Demokratîk û bi taybetî yên Kurd jê derdixînin "goristana komane li Efrînê jî wek nimûne", nema di ser kesekî xwedan wijdan û hişlicî re derbas dibin, û reqis û semakirina hin kesên Kurd li ser saz û awaza wan derewan kirêtiyeke mezin e.

18.07.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Giropeke wêneyan ji malên roxandî re, li G."Qaşa"- N.Bilbilê.
- Goropeke wêneyan ji malên roxandî re, li G."Cela"- N.Reco.
- Giropeke wêneyan ji rêweresmên oxirkirina Pakrewanan li 13.3.2018an û binaxkirina wan û goristana B.Efrînê berî dagîrkirinê re, û hin din ji kolandina tirban û derxistina terman jê di navêna 14-16 Tîrmehê 2021an de, ji aliyê destlatên dagîrker ve.
- Şehîd "Ridwan Cemîl Silêman".
- Şewata daristaneke N.Cindirêsê, 13.7.2021an, û têde qutkirina darên ihracê ya dema berê tê xuyakirin.
- Perçevîdyoyek e Goristana Efrînê, navîna Avdara 2018an:
https://www.youtube.com/watch?v=4racBl53VcY
- Perçevîdyoyek ji oxirkirina termên/32/ pakrewanan re û binaxkirina wan di goristaneke orta B.Efrînê de, 13.3.2018an Z.
https://www.facebook.com/227810150705865/posts/1990726417747554/